Kurd
Di navbera terora dewleta
Neteweyî û Islama Siyasî de
Xeleka-7
Wergêrana:Besam Mistefa

Têgihştina bedîhî ji van daxuyaniyan re biryara serkirdayetiyên tundrew bi rêkirina endaman berev gorepanên ji bilî gorepana nakokiya erebî-israilî ye, eva ku diviya bû ya sereke be,tevî çandina dubendî û nakokiyan di navbera milletên misilman de,gorepanên berbijar Efxanistan û Şîşan û Kurdistan û Îraq bûn û gelên van welatên navbirî bi giştî bi girêdana xwe bi perensîp û waneyên islamê ve têne naskirin û ne hewcedar in ko tukes ji Urdinê were û(riya siratê)nîşa wan bide.Teroristê navbirî bi xweberî venasînê bi şaşiyekê dide bê ko rastiya pirsê binase:

"Tiştê seyr ko van şêxan behsa deselatdar û emerîkiyan dikirin û di heman demê de şerê li dijî israilê mîna erkekî bingehînî di van rewşan de,ne dihjimartin".

Dîsa ew dibêje ko:"Dema ku min xwe amade kir da ku biçim–Beyare-min ji mîrê xwe pirsî:em dê li Kurdistanê şerê kê bikin?Bersiva wî wisa bû:kurdan di bakurê iraqê de deselateke komunist avakirine ji ber vê çendê em dê şerê ewan bikin".

Belê,bizavên islamî yên tundrew tevî sloganên xwe yên olî û çirisandî,di rastiyê de ji ideoljiya neteweyî a şovonist despê dikin û xwe bi cilika islamê dipêçin,eynî weke bizavên neteweyî yên şovonist yên ko erebbûyîn û islamê bi hev re girê didin û hewil didin ko perensîpên olê li berjewnediya bangewaziya neteweyî a şovonist bikar bînin,tiştê ko di eşkerkirina islambûyîna–Mîşêl Efleq-de hate diyarkirin.

Ji mêj ve ye ko,girûpên Islama Siyasî yên ereb li milê deselatdarên şovonist û nijadperest radiwestin û hema bi axaftinê tenê be jî berevaniya milletê kurd nekirine û ti nêrînên adilane derbarê tawana Helebçe û karesatên din yên ko hatine serê gelê kurd,
diyar nekirine.

Komara Islamî a Îranê rê li ber kuştina kurdan vedike û mafên wan napijirîne û hêjî vîn û xwestekên kurdên Îranê di bin navê yekîtiya misilmanan de,inkar dike.

Partiya Dad û Pêşveçûnê ya islamî û serdest li Turkiyê tevgera rizgarîxwaza kurd mîna dijmin dihejmêre û banga tunekirina wê ne tenê li Tirkiyê lê li Iraq û dewletên dîtir jî, dike .Bizavên Birayên Misilman li navçeyê di bername û acendên xwe yên siyasî û rêxistinî de li hebûn û maf û tevgera rizgarîxwaz ya kurdan mikur nayên.

Tevgerên isalmî yên deselatdar li Îran û Tirkiyê bi partiya Beesa sekûlara serdest li Sûriyê re arîkariyê dikin li hemberî kurdan û nepijirandina mafê wan di destnîşankirina çarenûsa xwe de tevî cidahî û newekheviyên wan li hemberî doza Kurd de.

Nêrînên ronakbîrên Islama Siyasî niha ji yên Beesî û tevgerên neteweyî derbarê mafên milletê Kurd yên adilane û têkoşîna wî a rizgarîxwaz û federasiyona wî a rewa li Iraqê ,ne cida ne.

Ev rastî bêtirî carekê di daxuyaniyên kongirên neteweyî-islamî yên ku di bin çavdêriya sentera yekîtiya erebî li Bêrûtê a nêzîk ji rêjîma Iraqiya herifî dihatin girêdan,de hate xuyakirin,eveye ku xwe li hember kêşeya milletê kurd a neteweyî yekdikirin û ji bangewazên arîkariya erebî-tirkî-îranî a fermî û millî li dijî gelê kurd bûn.

Li vir pêwîste ku em nûtirîn-karpêkên-rêjîma hevbendiya isalmî-neteweyî li(Darfora Sûdanê)û rêbaza wê di warê çareserkirina pirsgirêka neteweyî di riya kuştara wê ya tirsnak derheqê sedan hezar xelkên netewe û olên din bi navê şerkirina li dijî kafiran û biserxistina ereb û misilmanan li gel tilîliyên jinên-cincewîd-bi heman şêweya ku komikên Islama Siyasî li Iraqê seriyan dibirin,bibîr bînin.

Eger ku piraniya tevgerên neteweyî hewcedarê lixweveger û serrastkirina nêrîn û bernameyên xwe ne piştî ku sedemê hebûna xwe jidest dane û dest pêdikin ziyanê dighînin dozên milletên xwe,her weha tevgerên islama siyasî yên ko imperiyalizma navneteweyî û bizava ziyonist çavdêriya proseya damizrandin û xwedîkirina

piraniya baskên wê de beşdarîkir dema qonaxa cenga sar hewcedarên lixwevegerê ne ji ber ku wan destpêkiriye ko ziyanê dighijînin perensîpên olê û ji riya tolerans û rêçikên lihevkirinê û danûsitandinê derdikevin û derbasî dojeha teror û nijadperestiya kor dibin li gor mînaka sembolên xwe yên tawanbar weke(Bin Ladin û Zerqawî)Zerqawiyê ko di daxuyaniya xwe ya navdar de milletê kurd mîna dijminê diwemîn pişt Dewletên Yekbûyî yên Emerîka(DYA)dihjmêre bê ku israil destnîşan bike!Gelo ev tê wateya avabûna hindek rêzgelên nuh di warê hevbendiyên rojhilata navîn?Gelo sembol û ronakbîrên islama siaysî tên ku teoreyeke nuh derbarê pirsgirêkên nakokiyê ku bihna têkçûn û bêhêvîmayin û herifînê ji wan tê,ava bikin?

Di vî warî de,herdû teqînên dawî ku di hefteya bûrî de li seranserê Iraqê pêkhatin zêdetir ji nameyekê hildigirtin bo rêxistina Netweyên Yekbûyî a ku biryar wergirtiye bi rêkirina şandeyekê ve bo zaniyariyê û eşkerekirina şiyana lidarxistina hilbijartinên giştî li Iraqê berî dawiya Hizêrna dahatû,tevî nameya siyasî berev bipaşxistin anjî qedexekirina hilbijartinan da ku derfetên teqînên teroristî pirtir bibin û kaos û tevlîhevî berdewam bike û–valahiya legal-bidome.

2-Rehendê neteweyî kurdistanî:

Dîrokeka dirêj ya milletê kurd bi terora sîstematîk anjî terora dewletî re heye hinde ko li dirêjahiya qonaxên hebûna xwe û ji serdema emperatoriya Osmanî û Safewî ve bigire û dewletên ku piştî cenga cîhanê a diwem hatine avakirin û kurdistan li xwe parvekirin ta niha tûşî tavilê reng û şêwazên terorê hat weke tunekirin û koçbarkirin û dûrxistin û guherandina buneyadgeriya demografîk ya kurd û welatê wan , cînosayid û gef li hebûna wan a cografîk û mirovaî û dîrokî xwarin û(erebkirin û firskirin û tirkkirina)wan,ev hemî ji berhemên karpêka teroristî a sîstematîk in ko kurd heta niha rastî tên,ji ber vê çendê em dikarin bibêjin ko ev şêwe di kuştin û renckirina mirovan de ne biyan û jinişkêve ye di gorepana Kurdistanî de,tenê tiştê nû di vir de pêşvexistina terorê wekû blok û mekanîzim û armancên siyasî û fierhekirina sînorên wê da ku rêxistinên nehênî yên tundrew û takekes û girûpên kirêgirtî jî-jixwe rêxistinên teroristî tên ku bibin mîna mafiyayên cîhanî piştî ko li acendeyên xwe yên bawermend û tundrew armancên siyasî û mewdanî zêdekirin hinde ko bangewaziyên baweriyê tevî projeyên aborî û maddî û bazirganiya çekên tevkuj û teknolojiya xirap û bindestkirina dahahtiyên millet û dewletan weke bi serê Efxanistanê hat dema deselata Talîban wexta ku rêxistina el-Qaede–û lîderê wê Osame Bin Laden deselatdarî bidestxistin,bihewîne ye.

Bê guman, rikeberiyên terorist di vê pêvajoyê de ku rastî tevgera rizgarîxwaza kurdistanî bi giştî û li Iraqê bi taybetî tên di eslê xwe de vedigerin bo ideolojiya şovoniya sêgoşe: neteweyî-sekûlar,tundrew-ayînî,deselatdar û dîktator.Her weha,kom û layengerên ko bi van bawerî û konsept û nêrînên gotî ve girêdayî ne anjî yên ko serdestiya dewlet û rêjîman dikin li ser hindek armancên hevgirtî li dijî milletê kurd û tevgera wî ya neteweyiya rizgarîxwaza demoqrat lihevkirine derbarê lihemberderketin û tunekirina wê bi hemî şêweyên berdest ji bikaranîna çekên komkuj û operasiyonên tunekirinê bigire ta tu bigihêje destkuştina sembol û lîderên siyasî û têkoşer û ronakbîrên kurd.Di baweriya min de,tevgera demoqrata neteweyî kurdistanî di qonaxa bê de dê tûşî eniya van hêz û girûpên terorist were ko bûye dijminê sereke yê kurdan û doza wan a neteweyî û çavkaniya bingehînî ji biveyê derbarê ewlekariya neteweyiya kurdistanî. Dîsa,em di wê baweriyê de ne ko nakokî bi vî dijminê navhatî re dê gelek şêwe û alavên naskirî û nenas bi xwe bigire ji ber ku tevî berdewambûna nakokiyê bi rêjîmên şovonist û teror û planên wana,tevgera kurd dê rastî terora baweriyên tunderew û terora bangewziyên paşveketin û hêzên tarî û terora li dijî jinê û azadî û dahênanî û pêşketinê were.Guman tê de nîn e ko tiştê ko rastî kurdan di pêşerojê de were wan şayiste dike da ku roleke ku sînorên kurdistanê derbas dike berev herdû gorepanên herêmî û navneteweyî ve dike,û her weha wan amde dike daku ew ciyê xwe di cenga cîhanî a berfireh a ji çend salan ve lidar e li dijî terora cîhanî bibin.

Belê,li gorepana kurdistana Iraqê,paytexta lêgaletiya kurdistanî-Hewlêrê hindek teqînên xwekuştinê li pey hev qewimîn didu ji wan li dijî wezareta hindurû,û herduyên dawî li dijî herdû partiyên serke yên ko serkêşiya tevgera siyasî û hikûmetê dikin di wexteke nazik û

watedar de.Teqîn piştî eşekerkirina–ji Hewlêrênêrîna gelê Kurdistanê derbarê Iraqa nuh û federalisma kudistanê û piştî tevlîbûna tiwêjeyên millî û cemawerên berfireh di prsoeya amadekirina lidarxistina rapirsîna giştî"referandum"da ku millet mafê xwe yê çarenûsî destnîşan bike,her weha paş ku nûnerên gelê kurdistanê di encûmena niştimanî û wezaretê de ji ber haydariya wan derheqê avakirina Iraqa nuh û pêşkêşkirina piştgiriyê bi mebesta peydekirina alternatîvê demoqratê pirrengê federe ketin hewil û bizavê de.Dîsa,teqîn piştî ku têkiliyên dostanî û hevbendiyê di navbera gelê Kurdistanê ji aliyekî ve û hêzên hevpeyman û hikûmetên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê(DYA)û Birîtaniya ji aliyê din ve bihêz bûn, û piştî serkeftina ezmûna demoqratî li Kurdistanê û guherîna wê bo nimûneyekê ji gelên dîtir re,û piştî ko şiyana çareserkirina pirsgirêka kurtd li Iraqê li gor çareya ferede û yekîtiya arezûyî–ne di riya çareserkirina leşkerî û alavên tunekirin ê û birêvebirina pirsgirêk ê bi şêweya ewlekarî wek ku ji dehansal e ko ji aliyê rêjîmên Kurdistan dagîrkirî li herçar dewletan tête kirin-hate holê.
Operasiyonên teroristî yên behskirî paş ko navgînên ragihandinê yên erebî,fermî û nehikûmî dest bi belavkirina çewtiyan û gurkirina raya giştiya erebî li dijî milletê kurd û tawanbarkirina Kurdan bi hêwirandina girûpên Israilî û bikaranîna hêzên wê yên serbazî kirin pêkhatin....**berdewam dibe**.

Rehendê siyasî yê
Terora girûpên islamî
Li Kurdistanê

Herdû opersiyonên terosristî xwîndar li Hewlêrê paytexta herêma kurdustan federe di 1-ê Sibatê de ko di heman demê de yekemîn roja cejna qurbanê bû, pirsgirêka terorê a ko rehên xwe kûr berdane li sernaserê Iraqê ji dema rûxandina despotîzimê ve , careke din anî pêşî.Herweha, dema wê ji layekî ve û nîşankirina serkiradyetiyên siyasî û hikûmî û îdarî kurdî bimgrhînî ji layê dîtir ve gelek pirsan derbarê armancên siyasî yên rûdanê dadixin holê, tevî aliyên pilandan yên xwedî berjewndî û alavên kargêr û rewşên li hawîrdorê wê yên dûr û nêzîk û sedemên nîşankirina paytexta herêmê û herdû layngerên siyasî kurdî yên sereke ?Wisa, em lim hember du rehendên bingehînî ji rikeberiyên terorê ne:

1-Rehendê niştimanî yê Iarqî:

diyare ku hêz û layên teroristî yên herêmî û navdewletî di şerê rizgarkirina Iraqê de derfet dîtin ko çalakiyên xwe vejînin û tiştê ko li hindek deverên din ji cîhanê jidest xistibûn vegerînin di riya destpêkirina cengeke nû li gorepana Iraqî û tolsitandina ji DYA-yê.Di heman demê de,berjewndiyên gelek layan li dora komeka armancan di nav de lidijîderketina vegerandina serdestî û ewlekarî û seqamgîriyê ji aliyê milletê Iraqê ve civiyan, li gel pêşî li raman ko iarqa nuh bibe nimûneyek ji berdewamkirina guherîn û çaksazî di dirawesê û dewletên navçeya rojhilata navîn de girtin û rê li ber rêjîmên despotîk û dîktator vebibe ko ew bikaribin genedelî û zordarîkirina milletên xwe berdewam bikin û da ku azwer û armancên rewa yên milletên navçeyê di warê hêviyên pêşerojê de û peydekirina alternatîvên demokratîk de ji rêjîmên serdest yên genedel û sitemkar de , angu ta ku ew arezû û daxwaz kêm bibin û bêhêvîtî derbasî dilê têkoşerên guherîn û çaksazîxwaz bibe û pijirandina herêmî û navneteweyî bi nîv çareseriyan were û rêjîmên mîna yê Tirkî û hikûmeta wî a misilmana-tolerans û sekûlar –weke ku hindek wê bi nav dikin- bibine mînak.

Ev layengerên bi karên terorîstî tawnabr ji dema serokê Iraqî yê herifî û rêjîma wî a dîktatora hilweşî ji pilandan û fînanseker û kargêr û piştigr û bînerên ji derveyî Îraqê xasime ji cînarên herî nêzîk û girûpên ko sînor derbas dikin û hindekî dîtir ji hundirê Iraqê bi xwe û hemî jî alîgirên baweriyên tund û şovonistê pêdar in, pêktên.Her karekî terosristî ku ew pêk tînin namyeke siyasî û armanceke xuya li nik birayrderanhildigire.